

TEBAX 2022

The Hall

KURDÎ

KURDISH DIGITAL HERITAGE

Mîrata Çanda Kurdî
Li Dîjîtalê Tê Parastin



JENOSÎDA ÊZIDIYAN:
FERMANA 74AN
Ercan Dağ

KURDISH DIGITAL
HERITAGE
Erol Başak

TALÛKE Û GEFA
LI SER MEDYA KURDÎ
Murat Bayram

ÇÎROKA DEWLETA
KURDÎ
Necat Zivingî

LI SWÊDÊ
BIPÊŞKETINA
ÇANDA KURDÎ
Zeynelabidin Zinar

BENGÎTIYA
MEDYAYA CIVAKÎ
Siyabend ASLAN

TELESKOPA FEZAYÊ:
JAMES WEBB
Digikurd

TheHallkurdî
E-kovara çandî ya mehane
Hejmar 8, Tebax 2022

Damezrîner

Osman Kômürcü
Erol Başak

Editor

Erol Başak

Rûpelsazî

Ridwan Xelîl
ridwanxelil@gmail.com

Bergsazî

GrafiKURD

Navnîşan
London UK

The Hall Kurdî

Endama Koma
Kovargerên Kurd e

www.thehallkurdi.com


thehallkurdi@gmail.com

+44 7915 413436

@KurdîHall

TheHallKurdî

The Hall Kurdî



*E-kovara The Hall Kurdî hesas e ku kovar di wextê xwe de bê weşandin.
Ji fikrên di gotaran de hatine parvekirin û ji rastnivîsa wan nivîskar bixwe bersivek
û ne mecbûr in ku ew mîna yên weşanger û editor bin. Hemû gotar, nivîs, pêşgotin, reklam,
materyal û naverokên din bi niyetêke safî hatine amadekirin.*

NAVEROK



Nameya Edîtor

Erol Başak
Rojnamevan, London
► 4



Li Swêdê Bipêşketina Çanda Kurdî

Zeynelabidîn Zinar
Lêkolîner, Swêd
► 23



Jenosîda Êzidiyan: Fermana 74an

Ercan Dağ
Rojnameger, Stenbol
► 5




Îran Xanima Mucered û Cihê Wê di Radyoya Ûrmîyeyê de

Sewîm Qoserî
Mamosta, Mêrdîn
► 25



Kurdish Digital Heritage

Erol Başak
Rojnamevan, London
► 8




Bengîtiya Medyaya Civakî

Siyabend ASLAN
Derûnnas, Mêrdîn
► 29



Talûke û Gefa Li Ser Medya Kurdî

Murat Bayram
*Dîrektore Botan Înterna-
tionalê, Amed*
► 13




JIM JARMUSCH: Yek ji nûnerê herî serkeftî yê Sînemaya Serbixwe

Rûmet Med
Nivîskar, Wan
► 32



Çîroka Dewleta Kurdî

Necat Zîvingî
Nivîskar, Stenbol
► 20



Teleskopa Fezayê: James Webb

Digikurd
Lêkolîner, Washington DC
► 36

NAMEYA EDÎTOR

EROL BAŞAK

Ji Londonê silavên germ ji xwîner û dil-darên zimanê Kurdî re dişînim.

Ji ber germbûna kûrewî ye yan tiştêkî dîn e nizanim, bila ev mesele ji zanîstan re bimîne, mehên Hezîran û Tîrmehê gelek germ û xweş derbas bûn li Londonê. Tebax wisa berdeyam dike. Bi rastî me bêriya tavê kiribû. Germa havîna vir a van rojan ne kêmê ya welêt e. Di hewayên wiha xweş de rûdanên xweş jî qewimîn.

Li Londonê Mîrata Çanda Kurdî li platformên dijîtal hate qeyd kirin. Sulaiman Othmanê Kurdê Dêrika Rojavayê Kurdistanê ji bo parastina çanda Kurdî projeyek amadekir û ji Arts Council Englandê fon stand. Di projeya bi navê *“Kurdish Digital Heritage”* de çî nimûneyên çanda Kurdî yên li Londonê hebin wek xwarin, cilûberg, muzîk, govend, hûner hwd. bi rêya wêne, video, deng, hevpeyvîn û graffikan hatin qeyd kirin. Nasandina projeyê ku di amadebaşiyê de keda min jî hebû, di 22ê meha çûyî de hat kirin. Digel stran û govend û sohbetên xweş me şeveke gelek bi ber borand. Nûçe û hûnguliyên projeyê di vê hejmarê de heye.

Mixabin meha tebaxê salvegera êrîşa Şengalê û komkujîya Êzidiyên Kurd e. 8 sal berê cara 74em dîsa fermana Êzidiyan rakirin. Rojnameger Ercan Dag ji bo The Hall Kurdiyê Komkujîya Êzidiyan nivîsî.

Di vê hejmarê de me cî da raporta Botan Internationalê ku behsa talûke û gefa li ser çapemenî û medyaya Kurdî dike. Rapor ji îngilîzî hate wergerandin ser Kurdiyê û hinek jî hate kurtkirin. Ji bo vê raporta girîng ku gefa li ser medya û rojnamegeriya Kurdî ragihand cîhanê em spasiya dîrektorê Botan Internationalê Murat Bayram dikin.

Nivîskar Necat Zivingî vê mehê dîsa nivîseke gelek xweş hazir kir. Di gotara *“Çîroka Dewleta Kurdî”* de binêrin dîroknasê Yûnanî Heredot çawa behsa Împaratoriya Kurdan dike. Hûnê bibînin ka Kurdan çawa dewlet bi distûra Edaletê ava kirine.

Mamoste Zeynelabîdîn Zinar ji bo The hall Kurdiyê *“Bipêşketina Çanda Kurdî ya Li Swêdê”* nivîsand. *Swêd çawa bû navendeke rewşenbiriya Kurdî?* Zêdetir di gotara me de ye.

Dîsa di vê hejmarê de me beşa duyem ya nivîsa Sewîm Qoserî weşand: *“Dengbêjî li Radyoya Ûrmîyê û Dengbêjî Îran Xanima Mucered”*.

Medya û nexasim medya civakî êdî bûye parçeyêke jiyana me ya rojane. Derûnnas Siyabend Aslan li ser *“Bengîtiya Medyayê”* sekinî vê mehê. Sedem û rêyên tedawiyê dîsa di nivîsê de ne.

Di beşa sînemayê de Rûmet Med qala derhêner, senarîst û çêker Jim Jarmusch dike ku yek ji nûnerê herî serkeftî yê Sînemaya Serbixwe ye.

Meha borî li dinyayê rûdana herî girîng bêguman dîmenên teleskopa Webbê bûn. Dîmenên ku Nasayê parvekirin bû sedema kelecane. Lê gelo ev wêne tînan çî wateyê û divê ev rûdan çawa bînan xwendin? Digikurd ji bo we nivîsî. Meraqdarên feza û gerdûnê, jê neminin!

Zanîst û teknoloji bi we jî gava bi Kurdî be şêrîntir nine?

Ji kerema xwe di her qadên jiyane de zimanê xwe Kurdiyê bikarbinin.

Bimînin di xweşiyê de.

JENOSÎDA ÊZIDIYAN: FERMANA 74AN




ERCAN DAĞ

Rojnameger, Stenbol

ercandagk24@gmail.com

Êzidiyên li Şingalê, berê xwe didan ber tavê û rîtuêlên baweriya xwe bi vî awayî pêk dianîn lê di 3ê Tebaxa 2014an de roj li wan bû tarî û di vê êşa tarî ya kûr de li benda mizginiya dîtina wendayên xwe ne ku vegerin ROJA xwe.





Di ser komkujiya Şingalê re 8 sal derbas bûn, tevî evqas zeman û salan êşa wê ya li ser Kurdên Êzidî hêj derbas nebûye. Di mezin-tirîn komkujiya sedsala 21an de jin, zarok, pîr û kal tê da bi hezaran Êzidî hatin kuştin. Destdirêjî li jin û zarokên Êzidî hatin kirin. Di salên dawîn de li deverên cuda, gelek gorên bi kom ên Êzidiyan hatin dîtin. Çarenivîsa gelek Êzidiyan jî ku ji hêla DAIŞê ve hatin dîlgirtin, nayê zanîn ka sax in yan mirî ne? *Ji ber evqas êşên mezin û 74 caran fermanên li wan hatine rakirin, Êzidiyan xwe wiha didin pênasekirin: "Em, şaxa şikestî ya dara mirovahiyê ne."*

Bi Hezaran Êzidî Didin Ber Guleyan

DAIŞ, (bi navê Dewleta Îslamî ya Şam û Iraqê jî tê zanîn) bi armanca belavkirina fîkra Cîhadîst/Îslamîst di 8ê Hezîrana sala 2014an de dikeve bajarê Mûsilê ya ser bi parêzgaha Neynowa ya Iraqê. Piştî vê rûdanê, navçeya Şingalê ya ser bi Mûsilê ku giştiyê niştecihên wê Kurdên Êzidî ne, dikeve bin metirsiya êrîşa DAIŞê. Civaka Êzidî ku xwediyê bîr û baweriyeye cuda ne, ji ber ferzkirina fîkra cîhadîst a DAIŞê, zêdetir metirsîdar dibin. Ji ber metirsiya êrîşa DAIŞê, li Şingalê nêzîkî 400 hezar Êzidî, warê xwe diterikînin û dest bi koçê dikin. Bi sedan Êzidî jî ji bo ku nekevin destê DAIŞê dema ber bi çiyayan ve bi rê dikevin ji ber birçîtî, nexweşî û tîbûnê jiyana xwe ji dest didin.

4 Gundên Êzidî Bi Soza Kirîvên Xwe Dixapin

Êzidiyên li van 4 gundên di jêr da hatiye nivîsîn dimînin jî bi soza kirîvên! xwe dixapin û koçî cîhekê nakin. Lê mixabin komkujiyên herî mezin li van gundan pêk tên. Şêx Ahmed Caso yê Êzidî ku gundên Koço, Xatimi, Şehwani, Azimi û Gundê Til Kesaba Kevn girêdayî wî ne, beriya DAIŞ bikeve Şingalê li gel Ebu Hamza yê berpirsekî DAIŞê (Erebekî Mûsilî ye) ku beriya bibe endamê rêxistinê dostekî wî yê berê ye diaxive. Ebu Hamza, ji Şêx re soz dide ku "Ti Êzidî dê nekujin, milk û canê wan dê biparêzin." Li ser vê soza dostê berê (kirîv!) Şêx Ahmed xeber dişîne van 4 gundan da ku kes koçî cîhekî neke. Lê piştî ku çekdarên DAIŞê bi ser gundan

da diavêjin, bang li gundiyan dikin ku çî tiştên bi qîmet (zêr, tîlefôn, kompîtîr, pere) di destê wan de hebin, bînin bidin wan û ser de Misilmantiyê jî qebûl bikin. Lê gundiyan Êzidî ev daxwaz qebûl nakin.

Çekdarên DAIŞî, Şêx Ehmed jî tê da, mêr û jinên pîr li deverêkê dûrî gund didin ber guleyan û hemûyan dikujin. Cinazeyên wan, kom bi kom diveşêrin.

Di Sedsala 21an De Mirovan Difroşin

Bi hezaran jin û zarok jî bi otobêsan ber bi Telafer û bajarên cuda ve tînin şandin. Gêlek jin û zarokên Êzidî, bi destê DAIŞê ve li bazarên Raqqa, Telafer, Felûce, Mûsilê tînin firotn! Bazirganiya xulaman an go firotna mirovan di sedsala 15an de dest pê kiribû, di sedsala 19an de bi dawî bibû. Lê belê di sala 2014an de ji hêla DAIŞê ve careke din ev rûreşiya mirovahiye tê kirin.

Hejmara Êzidiyan ji hêla DAIŞê ve hatine dîlgirtin, derûdora 7 hezar kes tînin destnîşankirin. Nîvê wan yan bi navbeynkariya saziyên navdewletî, Hikûmeta Herêma Kurdistanê tînin xelaskirin yan jî bi derfeta xwe ji destê DAIŞê derivin. Piraniya wan jin û zarok, çarenivîsa bi qasî 3 hezar Êzidî hêj nayê zanîn. Ji xeynî kuştina mirovan DAIŞiyên hov êrîşî cîh û mekanên olî jî dikin. Herî kêm 65 mabed, îbadetxane tînin talankirin û xerakirin.



Êzidiyan li Şingalê, berê xwe didan tavê û rîtuêlên baweriya xwe bi vî awayî pêk dianînin lê di 3ê Tebaxa 2014an de roj li wan bû tarî û di vî êşa tarî ya kûr de li benda mizginiya dîtina wendayên xwe ne ku vegehin ROJA xwe.

74 Caran Fermana Êzidiyan Hat Rakirin

Komkujîya li ser Kurdên Êzidî cara ewil di sala 906an de bi fermana Parêzgarê Mûsilê Hamadanî pêk tê. Wê çaxê hezar malbatên Êzidî, ji ber ku Misilmantiyê qebûl nakin tînin qetilkirin. Ev tragediya yekem a li ser Êzidiyan heta 2014an 74 caran dubare bû. Loma komkujîya dawî ya DAIŞê li Şingalê pêk anî, ji hêla Êzidiyan ve wek Fermana 74an tê binavkirin.

Netewên Yekbûyî, Parlamentoya Ewropayê û 10 welatên cîhanê yê wek Amerîka, Belçîka, Kanada, Hollanda û Almanya tawanên DAIŞê yê li dijî Êzidiyan, wek jenosîd nas kirine. Parlamentoya Herêma Kurdistanê di sala 2019an de roja 3ê Tebaxê wek "Roja Jenosîda Êzidiyan" pejirand. Li Tirkiyeyê Parlatenterê HDP yê Êzidî Feleknas Uca, bi mebesta komkujîya li Şingalê ya ji hêla DAIŞê ve hate kirin wek 'Jenosîd' were naskirin, projeyasayekê pêşkêşî Parlamentoya Tirkiyê kir lê heta niha ev daxwaz nehatiye pejirandin.





KURDISH DIGITAL HERITAGE

EROL BAŞAK
Rojnamevan, London



Mîrata çanda Kurdî li Londonê li ser platformên dijîtal hate qeyd kirin û bi vî şiklî ev mirat dê bê parastin. Sulaiman Othman Kurdê Rojavayê Kurdistanê ku zêdetirê 12 salan e li Londonê dijî ji Arts Council Englandê fon stand û ev proje amade kir. Di çarçoveya projeyê de mînak û nimûneyên çanda Kurdî bi deng, dîmen, video, hevpeyvîn û graffîkan li ser platformên dijîtal hate qeydkirin. 22yê meha Tîrmehê de jî di mazûvaniya Kurdish House Londonê de bi bernamayeke taybet û bi beşdariyeke mezin proje hate nasandin.

Dagirkirina bajarê Efrînê ev fikr anî bîra min

Sulaiman Othman dibêje dema bajarî Efrînê ket û hate talan kirin ev fikr bi min re çêbû.

Beriya çend salan gava êrîş bi ser bajarê Efrînê de hate kirin û bajar ket, ez gelekî ber ketim. Lewra bajar dûvre hate talankirin. Ew darên zeytûnan yên bi ber hatin birrîn. Berhemên dîrokî hatin rûxandin. Min dît çanda me li ber tunebûnê ye û lazime em tiştekî bikin. Min li Londonê hûnera dijîtal xwend. Loma girîngî û bandora hûnera dijîtal baş dizanim. Min dixwest mûzeke dijîtal ava bikim ku tê de hemû nimûneyên mîrata dewlemand a çanda Kurdî hebe. Heke mûzeke normal be her kes nikare biçe, bigere û bibîne. Lê heke mûzeke dijîtal be ji her derê cîhanê Kurd û milletên din dikarin ziyaret bikin û hay ji çanda rengîn û qedîm a Kurdî bibin. Dinya alem kêm zêde dizane ku Kurd şervan in, li dijî Sedamê dictator

şer kirin, li dijî Daîşiyên hov şer kirin. Ji bo parastina axên xwe hêj jî şer dikin. Lê Kurd tenê ev nîn in. Çandeke wan a dewlemend heye. Bi hezar salan e li ser piyaye.

Min dixwest bila dinya alem vê yekê bizanin.

Em ê projeyê li bajarên din ên Brîtanayê jî nîşan bidin

Di çarçoveya fona Arts Councilê de proje bi Londonê ve sînoordarkirî bû. Loma me tenê nimûneyên Kurdî yên li Londonê xiste projeyê. Lê niha peymanê me bi Art Councilê re qediya. Em dikarin projeyê bigerînin. Wek mînak em ê bibin li bajarên din ê Brîtanayê jî bi pêşangehan nîşan bidin. Piştî bibin Ewropa û Amerîkayê.



Ez dixwazim hemû çanda kurdî li paltformên dijîtal qeyd bikim

Ez dikarim bêjim ku ev dest-pêk e. Em ê bajarên Kurdan, berhemên dîrokî û xweşikahîyên li van bajaran li platformên dijîtal bidin nasîn. Malpera me amade ye. Li ser youtube kanala me, li înstagramê hesabê me heye û li metaverse jî me mûzeyeke dijîtal a sê qatî ava kir. Di wir de berhem û naverokên ku me hazir kirine cîh digrin. Me mûzeyê çanda Kurdî anî berdestê we.

Projeya Mîrata Çandî ya Kurdî çî ye?

Projeya Mîrata Kurdî armanc dîke ku mîrata çanda Kurdî berhev bike, pîroz bike û biparêze û herwiha îlham û hêzkirinê bide kes û civakên Kurd.

Em ê nivîs, grafîk, deng û vîdyoyan li hawîrdorên dijîtal bikin yek, bihêlin ku bikarhêner û temaşevan bi çavkaniya vê naverokê re bikevin tîkiliyê.

Ev proje dê li ser mîrateya Kurdan û çawaniya avabûna nasnameya wan bisekine.

Proje dê li mîrateya çandî binêre, ku tê de berhevokên agahdariya li ser çawaniya jiyana mirovan, wek wêne, tablo, çîrok, cil û berg û xwarin dihevwîne.

Projeya mîrata kurdî wê bike ku mirov jêhatîbûnên nû pêş bixin, mirovên nû nas bikin û li ser dîrok û nasnameya civaka xwe kifşê bikin.

Proje jî bo avakirina Medyaya Dijîtal a Înteraktîf bi xebata hunermendên Kurd û civaka Kurd re hatiye çêkirin.

Bi piştevaniya dilnizm ya Arts Councilê em ê karibin:

- Ji nû ve sektora çandê ava bikin.
- Nasnameya çandî xurt bikin.
- Hişmendiya çandî bipêş bixin.

Ev proje dê hedef dîke ku çavkaniyek jî bo armancên perwerdehiyê peyda bike ku ji civakê re têgihîştinek kûr a mîrata xwe peyda bike.

Wekî din Proje bi peyda kirina dilxwazan hevgirtina civakê armanc dîke. Kesên li derveyê civakê jî dê bi saya vê projeyê derheqê civaka Kurd de agahdar bin.



Mîrata Çandî ya Kurdî cihekî afirîner dide civakê ku tê de çîrokên xwe parve bikin, mîrata xwe ya çandî biparêzin û bi hafizeya xwe ya takekesî û kolektîf ve girêbidin.

Proje mîrata gelê Kurd kifş dike ku ew gel bi dehsalan rûbirûyê êş û wendahiyan bû û ji wê demê ve mîrata wê di bin xetereyê de ye. Pevçûnên ku li Rojhilata Navîn diqewimin zirareke mezin daye mîrasa çandî ya Kurdistan. Ji talanê bigire heta wêrankirinê ku qet ranewestiya û heta qirkirina etnîkî ya sistematîk. Em di wê baweriyê de ne ku wextê vê projeyê ye û ev proje ji bo parastina mîrata kurdî pêwîst e.

Ji ber vê yekê, fonên Arts Council Englandê ji bo avakirina arşîveke dijîtal pir girîng bû, bi saya wê endamên civakê, nemaze nişê nû û yên ne Kurd, dikarin werin û nimûneyên dîrok û çanda xwe bibînin û çîrokên xwe bi wêneyan parve bikin. Ji ber ku gelek niştecî di derbarê mîrata Kurdî de hindik dizanin, proje rêyek peyda kir ku têgihîştinên negatîf rabe û mirov bikaribe di çanda xwe de tiştekî ku pê serbilind bibe kifş bike, ji ber vê yekê me kesên ku qet derfet nedîtine ji çanda xwe haydar bin xiste hedefa xwe û me di çalakiyan de cî da wan.

Her wiha ev proje dê belgeyên mîrata Kurdî ji bilî kurdan bigihîne temaşevan û guhdarên nekurd jî.

Proje dê amûrên dijîtal ên wekî medyaya civakî bikar bîne da ku bala her kesî bikişîne û bi wan kesan re têkildar be ku dixwazin mîrata xwe biparêzin û hesta xwedîtîyê zêde bikin.

Hûnermend û beşdarên projeyê wiha ne:

Mûzîkjen û Santurîst **Peyman Heydarian**

Damezrînera Kurd Coutureê **Prosha**

Hûnermendê Mixed Mediyê **Mariwan Jalal**

Hûnermend **Hasan Abdalla**

Hûnermend û Merşîkvan **Shorsh Saleh**

Nûnerên Govend Londonê **Ozgur Ataş û Duygu Dogan**

Xwediya Restoranta Xwarinên Kurdî Nandine **Pary Baban**

Nanpêj **Amîra Alî Rasoul**

Hûnermenda Hûnera Dijîtal **Koshe Salayî**

Koshe Salayî, Hûnermenda Hûnera Dijîtal

Min her gav cihana nû ya balkêş a hûnera Web3 û NFTê wekî amûrek dît ji bo parastin û pîrozkirina çandê ji hemî deverên cihanê. Dema ku ekîba Mîrata Dijîtal a Kurdî hat cem min, ji min re maqûl hat ku tişta ew hewl didin biparêzin, ez ê bînim nav galeriyên hunerî yên metaverse.



► Koshe Salayî

Min pêşangeha fîzîkî veguherand galeriyek hûnerî ya dijîtal li metaverseê li ser spatial.io.

Ev nêzîkwariya nû şanseke dide Mîrateya Dijîtal a Kurdî ku bi temaşevanên cihanî re têkildar be û wan li ser huner û çanda Kurdî perwerde bike ku em dixwazin di dîrokê de carekê ji wan re behs bikin. Galeriyên hunerî yên meta-verseê ji sê qatan pêk tê, jêzemin, qata yekem û qata duyemîn ku bi pencereyên camê yên ji erdê heya banî bi dîmenên deryayê dorpeçkirî ne. Xalên portal hene ji bo alîkariya avatara we di navbera qatan de bigere. Hûn dikarin ji lînka jêr biçin pêşangeha metaverseê ya mîrata dijîtal a kurdî.




spatial.io

Prosha, Damezrînera Kurdî Couture

Ez Prosha, hevdamerînera Kurdî Couture im. Em cilê kurdî çêdikin ji bo jinan. Ez vî karî bi meta xwe re dikim. Ew li Silêmanî dimîne. Ew material û qûmaşan peyda dike û dişîne Londonê û em jî li vir didûrûn. Em kelûpel û aksesorên Kurdî yê kevneşopî pêşkêş dikin. Em bi hêvî ne di pêşerojê de em ê kincên mêran û zarokan jî çê bikin. Me di sala 2020î de dest pê kir. Fikir di pandemiyê de ji me re hat. Ji ber ku em di lockdownê de bûn û kar û xebat sekinî bûn. Lê niha ku em ji lockdownê derketin ew baş diçe. Mişteriyên min piranî biyanî ne. Ji cil û bergên kurdî hez dikin. Alîgirên me yê ne kurd jî yê kurd zêdetir in. Û însela karê me li Londonê dê mezintir bibe.

Ev proje pir baş e. Ji ya ku me xeyal dikir pir çêtir e. Ew pêşangeheke xweşik e ku hunermendên serkeftî û kesên jêhatî yê cihêreng tê de hene. Bi rastî pir baş e ku meriv li vir ewqas Kurdên jêhatî dibîne. Ev tê wê wateyê ku projeyê civaka me gihandiyê hev. Divê ez pesnê yê ku ev organîze kiriye jî bidim. Kak Sulaiman bi rastî karekî pir heja kiriye.



► Prosha

Hesabên Kurdish Digital Heriatge wiha ne




kurdishdigitalheritage.org



instagram.com



spatial.io



youtube.com



► Sulaiman Othman
Rêvebirê Projeyê

TALÛKE Û GEFA LI SER MEDYA KURDÎ

MURAT BAYRAM

Direktorê Botan Internationalê, Amed
Wergera ji Îngilizi û Kurtkirin: *The Hall Kurdî*





Ji raporta Murat Bayram ê Dîrêktorê Botan Înternationalê

Di Endeksa Azadiya Çapemeniyê ya Cîhanê ya Rojnamegerên Sînomenas (RSF) de Tîrkiye di nav 180 welatan de di rêza 153'yemîn de ye. Çapemeniya bi tirkî bi astengiyên li pêşiya azadiya derbirînê re mijûl dibe, çapemeniya bi kurdî jî bi xetereya tunebûnê re rû bi rû ye.

Medyaya bi kurdî jixwe di hin waran de li Tîrkiyê tûşî windabûnê bûye. Rojnameyeke rojane bi kurdî tune, kanaleke radyoyê ya li seranserê welêt bi kurdî weşanê bike nîne, ajanseke nûçeyan a ku zimanê wê yê sereke kurdî ye, an kanaleke televîzyonê ya taybet tune ye, pêşkêşkirina bernamayan nûçeyan bi kurdî di weşana satelîtê de yan jî bi kabloyê ne pêkan e. Tenê televîzyonek heye ku nûçeyên bi kurdî dide lê ew jî ya dewletê ye.

Kurd Bi Zimanê Xwe Yê Zikmakî

Ji ber ku di Destûra Bingehîn a Tîrkiyeyê de hemû hemwelaî tirk tîns hesabandin, li welêt serjimartina nijadî nayê kirin. Ji ber vê yekê di îstatîstîkan de nifûsa kurdan bi awayekî fermî nehatiye diyarkirin.

Derbirîna nefretê li vir dest pê dike; ji ber ku ji mêj ve gotina Kurd qedexe bû, Kurd wek "ji rojhilat" an "mîrovên rojhilatî" dihatin binavkirin (ji ber bajarên Kurdan li rojhilatê Tîrkiyeyê ne). Dûv re heman binavkirin wekî "nezan", "nexwenda" an "nedîtî" hatine bikar anîn.

Di hevdîtinên me yê li gel şîrketa Rawest Research a Amedê ku li gorî lêkolînên wê pêk hatiye, em dibînin ku ji sedî 16-18 (13,49-15,18 mîlyon) nifûsa Tîrkiyeyê li malê bi zimanê dayikê bi kurdî diaxivin.

Li gorî ankêta Navenda Lêkolînên Qada Civakî-Siyasî ku "li 16 bajarên herêmên Rojhilatê Anadoluyê û Başûrê Rojhilatê Anadoluyê yê Tîrkiyeyê di derbarê bikaranîna zimanê zikmakî de hatiye kirin ji sedî 68,2yê koma temenê wan 18-24 salî û ji sedî 70yê kesên temenê wan 65 salî û mezintir di mala xwe de bi kurdî diaxivin."

Yên bi Tirkî diaxivin, hîn peyvna bûne ku Kurd di xîtabê hev de bi kar tînin. Ev hemû peyv wek heqaret di argoya Tirkî de cih girtine.

Ka em bibînin ew peyvên bi Kurdî di Tirkî de çawa hatine bikaranîn:

Kek: Kek (bilêvkirina wê: Keko!), di argoya Tirkî de: "keko"

Lawik: (bilêvkirina wê: Lawiko!), di argoya Tirkî de (ji ber di Tirkî de herfa "w" nîne): "lavuk"

Kur: (bilêvkirina wê: Kuro!), di argoya Tirkî de: “kîro”

Niha wek beşek ji argoya Tirkî ya îroyîn, peyva “kîro” û “keko” hîna li ferhengên saziya Zimanê Tirkî (TDK) nehatiye zêdekirin, lê bi maneya nedîtî, şepirze, rûreş û nezan tê bikaranîn.

“Lavuk” wiha tê pênasekirin: (Kesê) ku zêde li ser mijarên ne girîng disekine, di kîrin û gotinan de nebaş e.

Li gorî daneyên nefermî yên ku ji aliyê çavkaniyên serbixwe ve hatine pêşkêşkirin, li Tirkîyeyê zêdetirî 20 mîlyon Kurd dijîn.

Li welatekî ku li gorî anketan nêzî 15 milyon hemwelaî bi kurdî diaxivin, temsîliyeta medyaya ziman çawa ye?

Piştî ku em bi hin daneyan rawêşa medyaya Tirkîyeyê ya bi kurdî tehlîl bikin, em ê ji nêz ve li hûrgilîyên wê wênaya xemgîniyê binêrin.

Daneyên Medyaya Tirkîyeyê Bi Kurdî

Rojname bi kurdî

Li gorî daneyên Saziya Îstatîstîkê ya Tirkîyeyê (Turk-Stat) yên sala 2020î li Tirkîyeyê 4 hezar û 746 rojname û kovar tîn weşandin. Li welatekî ku 2 hezar û 164 kovar û 2 hezar û 582 rojname lê tîn weşandin, ne kovar û ne jî rojnameyên rojane yên bi kurdî derdikevin. Tenê rojnameyê hefteyî bi kurdî derdikeve: Xwebûn.



Televîzyon Bi Kurdî

Li gorî daneyên sala 2021ê yên Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê (RTUK) li Tirkîyeyê 350 kanalên televîzyonê yên satelîtê û 172 qenalên televîzyonê yên bi kablo hene. Ji 552 kanalên televîzyonê bi giştî tenê yek bi kurdî nûçeyan pêşkêş dike, ew jî kanala dewletê TRT Kurdî ye. Yekane kanala televîzyonê ya satelîtê ya taybet ku bi kurdî weşanê dike Zarok TV ye (ku ji bo zarokan nav-erokna pêşkêş dike) û tekane kanala televîzyonê ya ku weşana bejayî bi kurdî dike jî Amed TV ye.

Ajansa Nûçeyan Bi Kurdî

Li Tirkîyeyê ajanseke nûçeyan a ku zimanê wê yê sereke Kurdî ye, tune ye. Ajansa nûçeyan a herî mezin a ku vebijarka zimanê Kurdî lê heye Ajansa Anadolu (AA) ya dewletê ye. Zimanê sereke yên ajansên şirketên Kurd ên weke Ajansa Mezopotamya (MA) û JinNews jî Tirkî ye. Di nav vebijarkên zimanê wan de ji bilî Îngilîzî Kurdî jî heye.

Ji xeynî şirketên kurd û dewletê, tenê portalek nûçeyan heye ku vebijarka zimanê kurdî pêşkêş dike: bianet.org. Tenê portalek nûçeyan heye ku nûçeyên kurdî jî di nav de bi tirkî diweşînin: gazet-eduvar.com.





Radyoya bi Kurdî

Li Tirkîyeyê kanaleke radyoya neteweyî ya ku bi kurdî weşanê dike tune. Radyoya TRT Kurdî ku di vî warî de weşana herî berfireh a radyoyê dide ya dewletê ye. Li gorî Wikipedia, ev radyo “li herêmên Başûrê Rojhilat û Rojhilatê Anadoluyê yê Tirkîyeyê û navçeya Efrînê ya ku ser bi parêzgeha Helebê ya Sûriyeyê ye, bi kurdî weşanê dike.”

Perwerdeya Medyaya Kurdî

Li gorî daneyên motora lêgerînê ya Google, herî kêr 74 zanîngeh perwerdehiya medyayê didin û/an jî bi tirkî beşên medyayê lê hene. Bi peryên ku ji aliyê welatên Ewropayê ve tên dayîn, bi piranî komele û weqfên herî kêr 200 bernamêyên perwerdehiya medyaya Tirkîyeyê an jî bernamêyên lêkolîna medyayê organîze dikin. Piraniya wan li Stenbolê ne, herî kêr jî sedî 10 li Amedê ne.

Li Tirkîyeyê perwerdehiya medyaya kurdî qedexe ye, lê organîzekirina atolyeyan bi destûr e. Botan International, ku di dîroka dewleta Tirkîyê de yekemîn ofîsa perwerdehiya medyaya Kurdî ye, di sala 2020an de hatiye damezrandin û bi organîzekirina atolyeyan perwerdeyê dide; li ser medyaya dijîtal bi kurdî pirtûkên dersê amade kirine. Ji bilî Botan Internationalê hîn tu saziyeke perwerdehiya medyaya Kurdî tune ye. Saziyên wekî Atolye BÎA, Weqfa Mezopotamya û Komeleya Yeni Yaşam (Jiyana Nû) salê carekê atolye an semîneran li ser medyaya bi kurdî li dar dixin.

RSF yekem û hîn jî tekane rêxistina navneteweyî ye ku piştgirî dide projeyek perwerdeya medyaya Kurdî. RSF û Botan International hê jî hevkar in; lê belê ji xeynî RSF'ê hemû finansor fonên xwe yê perwerdehiya medyayê ji bernamêyên perwerdehiya medyaya bi Tirkî re vediqetînin.

Malperên Bi Kurdî

Ajansên bi vebijarka zimanê Kurdî gelek caran tên girtin. Malpera Ajansa Mezopotamya (MA) 35 caran (dema ku ev nivîs hat nivîsandin) hatibû girtin. Medyaya bi kurdî ya ku bi kanalên TV û radyo û rojnameyan re hewl dide hebûna xwe li ser înternetê bidomîne di bin gefan de ye.

Malper, ji xeynî malperên girêdayî ajans û kanalên televîzyonê, bi însiyatîf û hewldanên şexsî dixebitin. Ev malper, ku qezenca aborî bi dest naxin, bi saya xebatên dildar xebatên xwe didomînin. Nûnerê Google yê Tirkiyeyê, bernamaya Google AdSense Kurdî nas nake û piştgirî nade dayîna reklaman ji van malperan re. Ji van pereyên ku ji bo medyayê ji Tirkiyeyê re tên veqetandin jî, ji van platforman re nayê veguheztin. Ji bo malperan me sponsor peyda nekirin.

Malperên pêşeng bi piranî naverok li ser çandê hilberînin; hinek ji wan ev in: Diyarname (zanîna giştî û siyaset), Çandname (zanîna giştî), PopKurd (Çanda gelêrî), FlashHilat (Wênekêş), Kubar (Moda), Sînemaya Serbixwe (Sînema), Dîalog (Şano).

Rojnamegerî Di Navbera Du Welatan de

Li Tirkiyeyê heta 25ê Çileyay 1991î axaftina bi kurdî li gelemperiyê qedexeyê bû û piştî wê bikaranîna Kurdî di nav gel da serbest bû. Piştî vê, Kurdan bi "qaçaxî" dest bi weşana rojnameyekê kir. Rojnamegerên Kurd ji bo rakirina qedexeya weşanê mecbûr bûn ku heta sala 2002'an bisekinin.

Piştî sala 1992yan rojnameyên Welat (1992), Welatê Me, Dengê Welat, Hawar, Azadiya Welat û dîsa Welat (2018) yên hefteyî yan jî rojane derketin.



Hewldana Derbeyê û Medyaya bi Kurdî

Di dema "pêvajoya çareseriyê pirsê Kurd (2009-2015)" ya bi pêşengiya Partiya Dad û Geşepêdanê (AKP) de, bi dehan televîzyon û rojnameyên herêmî yên bi zimanê Kurdî dest bi çap û weşana xwe kirin.

Di sala 2016an de rayedarên dewleta Tirkiyê ragihandin ku Cemaeta Fethullah Gulen hewla derbeyê kiriye. Piştî vê hewldana darbeyê, tenê li Amedê 9 kanalên televîzyonê ku bi temamî yan jî beşeke weşana xwe bi Kurdî dikirin, weke Azadî TV, Gün TV, Zarak TV hatin girtin.

Piştî teşebûsa derbeyê, dewleta bi serkêşiyê hukûmeta AKPê kanalên televîzyonê yên nêzîkî cemaeta Gulen girtin; Qenalên ku bi Kurdî weşanê dikin jî para xwe di vê pêvajoyê de hildan.

Dewletê dest danî ser alavên weşanê û buroyên kanalên televîzyonê. Piştî, hemû kanalên televîzyonê hatin girtin; Zarak TV dîsa hat vekirin û Amed TV dest bi weşana bejayî kir. Lê heft kanalên televîzyonê nikarin weşana xwe ji nû ve bidin destpêkirin. Piştî Denge TV ku yekane kanala Êlihê ye hat girtin, parêzgehê jî ji televîzyoneke herêmî pê par e.

Kanalên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji Turksatê hatin derxistin

Piştî ku li Tirkiyeyê kanalên bi kurdî hatin girtin, tekane alternatîfa temaşevanên televîzyonên Kurdî, televîzyonên li derveyê dewletê weşanê dikin bûn.

Kanalên alternatîf ên ku di Satelita Turksatê de mabûn Kurdistan24, Waar TV û Rûdaw TV bûn, ku mezintirîn kanalên televîzyonê yên ser bi Hikûmeta Herêma Kurdistana Iraqê (HHK) bûn.

Lê di sala 2017an de ev her sê kanalên televîzyonê ji peyka Turksatê hatin derxistin û lîsansa weşanê ya wan hat betalkirin.



Kurdî wek karekî terorîst nîşan didin

Belkî jî çîrokeke jîyanê herî baş rewşê zelal bike... Şaredariya Amedê niha ji aliyê Waliyê Amedê ve li şûna hevşaredarên hatine hilbijartin weke qeyûm hatiye tayînkirin.

Şaredariyê di 02.12.2021an de bultena xwe ya ji 5 hejmaran pêk tê û bi navê “Keremke” weşand. Piştî serdana Serokomar Recep Tayyîp Erdogan manşeta rojnameyê jî bi kurdî wiha bû: Ser Seran Ser Çavan. Diyarbekir (Nîşe: Erdogan di serdana xwe ya Amedê de ev hevok anî ziman).

Dema xebatkarê Walîtiyê ev bultena han dibir Walîtiyê, ji aliyê polîsên Dijî Terorê ve hat binçavkirin. Dema dîtin ku navê rojnameya ku pê re hebû bi Kurdî ye, dest bi lêdanê kirin. Heta ku karta xwe ya personelê ya ku li Walîtiyê dixebitî nîşanî polîsan bide û rewşê webeje, rastî lêdanê hatiye û ji aliyê polîsan ve nehatiye berdan.

Çanda lîncê, hedefgirtinê, gilîkirinê

Hemû dezgehên ragihandinê yên bi kurdî kodkirî ne/ tê xwestin ku bi rêxistin an jî saziyeke siyasî re bîn kodkirin. Komên radîkal rojnamegerên ku kodkirî lîncê dikin. Lîncêkirina herî zêde bi sernavên wekî “terorîst”, “xayîn”, “ajan”, “xwefiroş”, “dijminê olê”, “alîgirê hukûmetê”, “medyaya hewzê”, “alîgir” û “berdevkê hêzên derve.” Bikaranîna nifiran jî berbelav e.

Dibe ku ev kiryarên kodkirin û lîncêkirinê jî piralî bin. Çawa kesên ku rojnamegeran lîncê dikin dibe ku bînav bin, rêxistin, rayedarên dewletê an jî rojnameger jî dikarin rojnamegeran bikin hedef.

Helwesta Dewletê ya Li Hember Xebatên Medyaya Kurdî

TRT Erebi hemû peyamên xwe yên medyaya civakî bi zimanê erebî diweşîne. Di bernameyên wê yên televîzyonê de jêrnivîsa Tirkî tune.

TRT World hemû peyamên xwe yên medyaya civakî bi Îngilîzî diweşîne. Di bernameyên wê yên televîzyonê de jêrnivîsa Tirkî tune.

TRT Kurdî ji bilî naveroka bi Kurdî, di medyaya civakî de peyamên pêşkêşkerên naverokê yên Tirkî yên wekî “TRT Corporate”, “TRT” û “TRT Kurdî Turkish” jî diweşîne. Bi rastî jî peyamên Tirkî yên rêveberên TRT’ê parve dike. Tevî ku ji 18 kanalên TRT’ê 15 jê bi Tirkî weşanê dikin jî, TRT Kurdî ku tekane kanala bi Kurdî ye, bernameyên xwe bi jêrnivîsa Tirkî pêşkêş dike.

Xebatkarên TRT Worldê perwerdeya nûçeyan bi Îngilîzî û yên TRT Erebi jî bi Erebi, xebatkarên TRT Kurdî jî li ser nûçeyan bi Tirkî perwerdeyê dibînin.

Dewleta ku kanala xwe ya bi Kurdî hebe, çapemeniya bi Kurdî ji windabûnê rizgar nake; bi rastî jî rastiya medyaya bi kurdî dixê xeterê.





Divê Bi Lezgînî Çi Bê Kirin?

Dewlet

Divê medyaya bi kurdî ji çarçoveya çalakiyên terorê derxîne; qedexeya li ser perwerdeya medyaya kurdî rake; perwerdehiya medyayê û pêşkêşkirina derfetên kar fînanse bike; alavên medyayê yên desteserkirî li wan vegeirîne.

Piştgirên mafên mirovan

Divê ji bîr nekin ku zimanê dayikê yê çaryeka nifûsa Tirkiyeyê Kurdî ye; divê ji bîr nekin ku pêşkêşkirin û wergirtina nûçeyan bi zimanê dayikê yek ji mafên bingehîn ên mirovan e; medyaya bi Kurdî fînanse bike û teşwîq bike.

Dezgehên ragihandinê yên bi Kurdî


Divê ked û xebata rojnamegeran di çarçoveya "têkoşîn", "hebûna rewşenbîrî" û "berxwedanê" de nebîne, ji ber ku rojnamegerî pîşe ye, berdêla keda rojnamegeran bide; divê di warê rêbazên medyayê yên nû de paşde nemîne.



ÇÎROKA DEWLETA KURDÎ

NECAT ZIVINGÎ

Nivîskar, Stenbol



“Danayê mu’emmerê kuhensal

Evrengêhe go ji bo me ehwal”

Çîrok bi vê beytê dest pê dike. Çîrokbêj “zanayê pîr yê saldîti” ye. Ev pîrê 2500 sal berê jîyaye û bûye bavê dîroknasîyê Herodotê Yûnanî ye. Çîroka me Kurdan jî ew dibêje.

Di dîrokên kevn de Kurdan yek ji împeratoriyan herî mezin ava kir. Lêbelê, li gor vegotina Herodot, ne ji bo yexma û talanê, ne ji bo feth û îşxalê û ne bi çavsofî û xwîndariyê. Şifre û sêhra vê dewletê yek peyv bû: Edalet (dadmendî).

Deîokes di nav êlên Kurd de hakim û dadwerek bû. Kê li hev nedikir, diçûn dîwana wî. Wî jî edalet belav dikir û kêşeyên gel çareser dikirin. Wê demê Medî di bin desthilata Aşûriyan de bûn. Ji 6 êlan pêk dihatin: Bûsî, Paretakenî, Strukhatî, Arîzantî, Bûdî û Magî. Aşûriyan ji pênsed salî û vir ve herêm birêve dibir. Di nav gelan de pêşî Medî ji bin hukmê wan derketin û serxwebûna xwe ragihandin, azad bûn. Lê çawa?

Demekê Deîokes xwe bi paş ve dikişîne û êlên Medî li gelek tevlihevî û destdirêjiyan rast tên. Ji bo pêkanîna dad û aramîyê dixwazin yekî ji nav xwe wek key/Qral hilbijêrin û pergalekê deynin. Dadwerê rastgo û adil tê bîra wan. Diçin li deriyê Deîokes dixin. Deîokes ji wan qesrekê û parastvanan dixwaze. Daxwaza wî bi cî tînin. Deîokes dest bi çareserkirina pirsgirêkên wan dike. Doz û gilf bi nivîskî tên ber destê wî û ew jî hukmê xwe dinivîse. Bi vî awayî bangê dewleta Kurdî bi dadwerekî û qonaxa edaletê tê avêtin.

Piştê Deîokes dibîne ku Medî hemî daxwazên wî dipejirînin, ew jî bajarê Ekbatana (Hemedan) bi heft sûran çêdike û qanûnan datîne. Berya zayîne di sala 678an de dewleta Medya tê damezrandin. Deîokes dewletê bi edalet bi rê ve dibe. Piştê kurê wî Fraortes dikeve dewsa wî. Bi Medîyan bes nake û hukmê xwe li ser Persî û gelên din fireh dike. Asyayê dixwe bin hukmê xwe. Piştî Fraortes ji aliyê Aşûriyan ve tê kuştin, kurê wî Keyakser tê ser text û dewleta Medya digihîne asta herî bilind. Yêkîtiya hemî êl û eşîrên Medyayê çêdike, Bi Babîlî û Lîdyayîyan re şer dike. Kapadokya dixwe bin hukmê xwe û çemê Halysê (Kizilirmak) dike sînorê xwe û Lîdyayîyan. Lîdyayîyan têk dibe û bi ser Nînewa de diçe. Îskîti û Aşûriyan têk dibe. B.Z di sala 612an de împeratoriya Aşûriyan dirûxîne. Di şerê Medî û Lîdyayîyan de roj tê girtin û peymana aştiyê tê danîn. Ji bo aştiyê Keyakser bi Aryenîsa keça Kroisos re dizewice. Piştî Keyakser, kurê wî Astyages dibe keyê Medan yê dawî.

Rojekê Astyages xewnekê dibîne û difikire ku wê kurekî keça wî Mandane çêbibe û desthilata Medan birûxîne. Li gor vegotinên Herodot di dema xwe de Medî çîna serdest bûn. Persî yek ji gelên bindestê wan bûn. Dema Astyages xewnê dibîne Magî jê re wiha dibêjin:

“Keyê me! Ji bo me ya giring ew e ku hukmê te têk neçe. Heger bi awayekî din bibe û desthilat bikeve destê vî zarokê Persî, wê bikeve destê bîyanîyan û em ku Medyayî ne, heger em bibin bindestê Persîyan, wê ti giraniya gotina me nemîne.”

Ji ber Medî ji çîna serdest bûn, Astyages keça xwe nade yekî Medî. Ji bo pêşî li kehanetê bigre wê bi Kambîsê Persî re dizewicîne. Piştî Kyros çêdibe, dide fermanarê xwe Harpagos û dixwaze wî bikuje. Harpagos jî wî dide şivanekî ji bo li çiyê bikuje. Lêbelê şivan Kyros nakuje û mezin dike. Piştî salan, dema Astyages bi vê dihesê ji bo cizakirinê kurê Harpagos dikuje. Kyros jî ji mirinê xilas dibe. Lêbelê ev yek di dilê Harpagos de dibe kul û kîn.

Dema Kyros mezin dibe Harpagos bi dizî pê re dikeve têkilîyê û dixwaze heyfa xwe ji Astyages hilîne. Kyros jî Persîyan dide hev û banga derketina ji bindestîya Medan li wan dike. Dema Kyros banga serhildanê li Persan dike wiha dibêje: “Bawer im qedera min ji bo vî karî ye. Hûn jî ji ti aliyî ve, bi taybet ji aliyê şervaniyê ve ji Medîyan ne kêmtir in. Fêm bikin û demildest dev ji Astayges berdin.” Bi vî awayî Persîyên heta wê deme nebûbûn dewlet ji xwe re serokekî dibînin û fikra rizgarbûna ji bindestîya Medîyan geş dibe.

Di şer de Harpagos aliyê xwe diguherîne û Kyros bi ser dikeve. Dema Astyages dil



dikeve destê Persîyan, ji Harpagosê Medî re wiha dibêje: “Tu herî ehmeq û niheqê mirovan î. Madem te dê ev tişt bikira, te karibû tac bide serê xwe. Te Medî kirin bindestê koleyên wan.”

Bi vî awayî B.Z. di sala 550 de Dewleta Medê ji aliyê Kyros ve tê ruxandin. Dewleta Axamenîyan tê damezrandin. Yekem car Persî azad dibin û têne ser hukim. Her çiqas piştî dewleta Medya, dewleta Persîyan ava bûye jî, bandora Medîyan domîyaye. Persîyan ji pir alîyan ve xwe şibandine Medîyan û di fermanarîyê de cih dane wan. Dema Keybanûya Massagetê ji Kyros re name şandîye wiha gotîye: “Keyê Medan, dev ji van karan berde.”

Piştê Kyros bi fermanarîya Harpagosê Medî Lîdya, Babîl

û Fenîkeyê bi dest dixwe, hukmê xwe fireh dike. Di dema kurê wî Kambîs de Persî Misrê jî bi dest dixin û heya Qartacayê diçin. Di serdema Kambîsê kurê Kyros de du magên Medî dest datînin ser textê Îranê û nêzîkî salekê dewletê birêve dibin. Piştê bi “Komkujîya Magîyan” dewlet dîsa dikeve destê Persîyan û Daryûsê Yekem.

Ji wê demê heya niha hevberîya Kurd û Persîyan ji bo text û desthilatê didome. Herodot di gelek cîyan de Îranî û Medîyan ji hev cuda dike û peyva “Îranî” ji bo Persîyan bi kar tîne. Ji vê çîrokê dîyar e ku li erdnîgarîya Îran û Kurdistanê pêşî êlên Kurd gihane hev û dewleta xwe çêkirine. Piştê Axamenîyê niv Medî niv Persî hatine ser hukim û her ku çûye desthilat ketîye destê Persîyan. Di ruxandina dewleta Kurdî û damezrandina dewleta Persî de rola herî mezin ya fermanarê Kurd Harpagos e. Harpagos ji bo tola xwe, xayintî bi qewmê xwe re kiriye û hemî zanî û lehengîya xwe xistiye xizmeta Persîyan.

Ya balkêş ev e ku çîroka dewleta Kurdî bi lêgerîna edaletê û keyatîya dadwerekî dest pê dike. Kurd îro jî di nav alozîyeke dijwar de ne û li edaletê digerin. Gelo wê careke din karibin ji vî bindestîya bêrûmet xilas bibin û serwerîya xwe ava bikin? Heger zana û zil-hêzên wan dev ji xizmeta xelkê berdin û bikevin xizmeta gelê xwe çima nebe! Silav li ruhê serfiraz yê Deîokes û Keyakser. Bila himetê li neviyên xwe bikin da ji vî bindestîyê xilas bibin.

LI SWÊDÊ BIPÊŞKETINA ÇANDA KURDÎ

ZEYNELABÎDIN ZINAR

Lêkolîner, Swêd, pencinar.z@gmail.com



Swêd welatek e ku niha bi qiraliyetê îdare dike, lê axaftina siyasî ji Qiral re qedexe ye.

Di demokrasî û mirovperweriya xwe de, Swêd yekemîn welat e ku li Skandinyayê dimîne û jê re "Dewleta Refahê" tê gotin.

Zagona wê ya bingehîn, maf daye hemû tiştên zindî û nezindî û kuştina mar û mişkan jî qedexe ye.

Mirovatî û camêriya Swêdiyan, tev di destên dewletê de ye. Çi kesê ku li Swêdê hatibe dinyayê û heta ku diçe, di binê garantiya dewletê de ye. Dewlet berpîrsê her kesî ye û alîkariya madî û manewî dide her kesî, lê li dinyayê welatê herî zêde ku bac ji hemwela-tiyan werdigire jî, dîsa Swêd e.

Cara pêşî çûna Kurdan a Swêdê, piştî Şerê Cîhanê yê Dûyemîn çêbûye. Lê piştî Cuntaya 1961an a Tirkiyê, hindik kes çûne wirê.

Piştî Gefdengiya 1971an a Tirkiyê, gelek Kurd çûne Swêdê.

Lê piştî desthelatiya Xumeynî 1979an û Derbeya Leşkerî ya Tirkiyê 1980yî, bi girseyî Kurd çûne Swêdê. Ji xwe dema desthelatiya Sedam Huseynê zal, gelek Kurdên Başûr çûne li Swêdê bi cih bûne.

1991, dema Yekîtiya Sovyetan jî rûxiyaye, gelek Kurdên li wan welatan jî, çûne li Swêdê bi cih bûne. Xasma jî Kurdên ku li Ermenistanê bûn, zexta Ermenan Kurd ji gundên wan qewirandine û pîranî çûne Swêdê.

Di van salên dawiyê de, gelek Kurdên Rojavayê Kurdistanê jî çûne li Swêdê bi cih bûne. Niha tê gotin ku jimara Kurdên li Swêdê li dora 200 hezarî ye.

Lê çewa ku Stockholm paytexta Swêdê ye, ji dinyayê re bûye Paytexta Kulturî. Herweha Stockholm ji bo Çanda Kurdî jî bûye navendeke girîng û wek paytext tê hesabandin.

Piştî diyar bû ku navenda hemû rêxistinên kurdistanî jî li Swêdê bi cih bûne.

Çi ji aliyê xwendina zarokên Kurdan bi kurdî be, çî ji bo xwendina ciwanên Kurd li zanîngehan bi kurdî be, herweha çî jî ji bo re-üşenbîrên Kurd be, li Swêdê bipêşketineke mezin çêbûye.

Sal 1983 yan 84an bû, Swêdê ji bo kurdên ku li welatê xwe ma-mostetîya erebî, farisî û tirkî dikirin xwendegehek vekir û du sal perwerdehiya kurdî da domandin. Piştî ew Kurd tev wek mamosteyê Zimanê Kurdî li dibistanên Swêdê yên ku zarokên Kurdan lê dixwendin darsa kurdî dane wan.

Saziya dewletê ya bi navê KULTURRÂDETÊ aliyê aborî dida re-üşenbîrên Kurd. Hetanî dawiya sala 1999an, 480 pirtûkên kurdiya kurmancî ya bi tîpên latînî bi diravên dewletê çap bûne.

Ev hawe tîneke mezin li Kurdên li Swêdê kiriye û zimanê fermî di nava Kurdan de bûye Zimanê Kurdî.

Herweha ev hawe tîna xwe li Kurdên li welatên dî yên li Ew-rûpayê jî kiriye. Her ku diçû, li wan welatan jî xwendina kurdî ji bo zarokên Kurdan dest pê dikir.

Di pêşerojê de ger lêkolîneke berfireh li ser Kurdên li Swêdê çêbibe, wê derkeve holê ku gelek hêjayî û derfetên bêhempa ji bo Kurdan hebûne.

Sal 1987, dema min li Swêdê weşanxane û çapxane ava kirine, pêşî bi alîkariya diravên dewletê dest pê bûye. Dewletê, ji 20î zêdetir, alîkariya diravî daye pirtûkên min. Dema ku dirav ji bo pirtûkekê dida min, bi wî pereyî min kaxez û pêdiviyên çapkirina pirtûkan dikirîn û li ser hev 3-4 pirtûkên kurdî çap dikirin. Herweha saziya bêkaran jî karmend didane min û mûçeyê wan dewletê dida. Ji 40 nivîskar û hunermendên Kurd zêdetir, bi qederê şeş meh an salekê, min kar li ser navê weşanxaneyê xwe daye wan û mûçe dewletê dida wan. Min tenê peymanek bi wan re çêdikir ku ew dê pirtûk ji xwe re bi kurdî binivîsin.

Spas ji Xwedayê mezin û dewleta Swêdê re, bi alîkari û derfetên erênî yên wan, heta niha jimara pirtûkên min ên ku hatine weşandin, gehaye 132an.

Bi hêviya geşemendiya Çanda Kurdî, her şad û bextewer bin...

ÎRAN XANIMA MUCERED Û CIHÊ WÊ DI RADYOYA ÛRMÎYEYÊ DE

-BEŞA DUYEM-

SEWÎM QOSERÎ

Mamosta, Mêrdîn





Îran Xanima Mucered di sala 1950-1951an de li rojhilatê Kurdistanê li gundê Înkasûya li herêma Biradostan ji dayik bûye ku ew der niha girêdayî bajarê Ûrmîyeyê ye. Navê dîya wê Perîşan bûye. Navê bavê wê jî Ebdurrehman bûye. Malbata Îran Xanimê malbateke feqîr, cotkar û karker bûye. Ciwaniya wê di nav malên dewlemend û mezin de wek karker derbas dibe. (Oramar, 2016: Bername Awaz).

Îran Xanim hêj di ciwaniya xwe de dest bi kilamgotinê dike. Li dawet, şahî û şînan de gelek kilam, stran û zêmar gotine. Bi ciwanekî re dizewice ku navê wî Seîd e û ew jî ji herêma Ûrmîyeyê ye. Paşê ew û hevserê xwe Seîd diçin gundê Somanawa li wir niştecih dibin. Du kur û qîzeke wan çêdibe. Îran Xanim dev ji kilamgotinê bernade û îcar bi hevserê xwe Seîd re diçin dawet, şahî û malên mezinan bi dehan stran distrên. Hevserê wê Seîd gelek piştgirî dide wê. Îran Xanim di sala 1970-1971an de bi awayekî fermî di beşa Kurdî ya Radyoya Ûrmîyeyê de dest bi kilamgotinê dike. Li gorî gotina hin kesan jî Îran Xanim bi qîza xwe Gulistanê re diçû Radyoyê û berî ku bibe êvar jî dihate malê bo ku peyv û gotinên nexweş derbarê wê neyê gotin û bihîstin. Çimkî di nava civateke eşîrî de bi tena serê xwe çûyîna radyoyê û kilamgotina jinekê wêrekîyek û xîreteke mezin dixwest. Di wê demê de Îran Xanimê wê rewşa hişk û tund a li hemberî jinan, bê tirs şikand û dengê wê li herêmê her ku diçû belavtir dibû. Tenê ne li Rojhilatê Kurdistanê, li Bakurê Kurdistanê jî dengê wê bi taybetî jî li bajarê Hekarî, Wan û Agirîyê belav û naskirî bû. Îran Xanimê bi sedan kilam gotine. Tê gotin ku wê sih û yek sal dengbêjiya xwe domandiye. Hinek ji kilamên wê ev in: Arifo Lawo, Bajo Emrê min, Delal Ez Bi Heyran, Bavê Lalo, Delal Lo, Delalê Malê, Lê Meyrê, Bavê Edo, Bavê Filît (Axao), Wey Narîne, Lêlê Yeman (Domamê), Werî Lêlê (Zerîyê), Bavê Fîrhê û hwd. Her ku diçû hezkiriyên dengê Îran Xanimê li bakurê Kurdistanê zêdetir dibû. Çûn û hatina Îran Xanimê ji bo kilamgotinê li Radyoya Ûrmîyeyê heta sala 1979an didome. Paşê bi Înqilaba Xumeynî ra kilamgotina Kurdî li radyoyê qedexa dibe, rewş zehmettir û xirabtir dibe Bi giştî ji bo hemû Kurdan û bi taybetî jî rê li ber xebat û hunera

Kurdî tê girtin. Vê guherînê jî bo hunerhez û dengbêjan zordestîyeke mezin bi xwe ra anîbû.

Kilamên Wê

Îran Xanim di Radyoya Ûrmîyeyê de nêzî 200 sed kilam tomar kirine. Bi zaravayê Kurmancî straye. Gelek kilamên ku ji berê de hatiye gotin strane û digel wê jî hin kilam bixwe çêdikirin û distran. Dema ku em bala xwe didin naverokên kilamên ku Îran Xanimê strane, du xalên giring dibînin. Ya yekem; Îran Xanim piştî ku ji hevserê xwe Seîd vediqete, gelek di bin tesîra wî de dimîne û dîsa jî dev ji jiyana xwe ya hunerî bernade, dengbêjiya xwe didomîne. Ev jiyana û rewşa wê, êşek û xemgînîyeke mezin li dengê wê bar dike. Di kilamên wê de êşa evîndarî, mêrxasî, neteweyî û banga hişyarî û civakî tê hîskirin. Piştî ku bi Dadaş Nasirî ra dizewice, temaya kilamên wê zêdetir dibe evînî. Em dikarin bibêjin ku wê di kilama Arifo Lawo de her wekî gilî û gazinek xwe li hevserê xwe yê berê kiribe. Vê tesîrekê li bijartina kilamên wê jî kiriye ku dê paşê wan bistrê (Oremar, 2016: Bername Awaz). Me di vê xebatê de kilama Arifo Lawo, Meyrê, Lêlê Dotmamê, Bavê Lalo, Delal, Mala Min, Bavê Edo, Werî Lêlê

(Zerîyê), Bavê Fîrhê û Bavê Filît (Wey Axao) deşîfre kirine û bi hin varyantên wan ên din ra berawird kirine û çendek çirokên kilaman jî peyda kirine û digel kilaman parve kirine.

Kilama Axao (Senar Mamedî)

Yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo de yo yo yo maqûlo yeqîn şer e
 Wey axao vê sibê wezê Çemê Serhenanê sêyr lêketê Gilîdaxê ye
 Maqûlo vê sibê wezê Çemê Serhenanê sêyr lêketê Gilîdaxê ye
 Ji vê sibê şer e ser serê bavê li Esho
 Kama û kerwanê Îranê dikişiyane ser cadê ye
 Cewed vê sibê da bi sê denga gazî dikir digo bavê Eshed
 Tu li meydanê bisekine ezê werme Têhrana şewitî bikim şikayeta cendirmê Îranê ye
 De yo yo yo de yo yo de yo yo de yo yo yo maqûlo şer giran e
 De yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo axao şer giran e
 Tu dêna xwe bidê wê sibekê ji Girê Bişîmana...? şer danane
 Axao ji sibê girê da...? îmana şer danane
 Tifinga destê Bavê Esho keçî caba Tirka ji yeqîn malê bi Alman e
 Mi dî vê sibê du peya ji mal derketin xwe rext û çeka di pêçane
 Ji peyayê ortê tê ji ber gula malê nehewiyane
 Ji peyayê pê şayikê Senar Bavê Çengîz, reîsê êl û eşîrata Mamedîyan e
 De yo yo yo yo yo êyyy yo yo yo yo yo êyyy de yo yo yo axao şer giran e
 De peyayê pêşê Senar Bavê Çengîz reîsê êl eşîrata Mamedîyan e
 De gurgê çavbel şêrê navmilpan e
 Her çî wextê ortê meydanê disekine çisse dike ema serê çî axao çî maqûla nexuyane
 De yo yo yo yo yo yo yo yo de yo yo yo axao yeqîn şer e
 Ax de yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo axao
 Vê sibê wezê Çemê Serhenana şewitî sêyr lêkete
 Zozanê sayîşeka şewitî seyr lêkete semta
 Serhenanê Cewed sê denga gazî dikir Bavê Filît dêna xwe bidê
 Ji ser serê Bavê Çengîz şer e xweş tê dengê tanqa li topa
 Na welle babo giran e xweş tê dengê mîrata cebilxanê
 Na welle babo giran e mîrata cebilxanê
 Qorqîma dara sê denga gazî dikir digo axao tu teslîm be
 Ji tifinga milê xwe bîne ji min re danêêê

Kilam kilameke mêrxasiyê ye. Şerê di navbera Kurdên Mamedî û dewleta Îranê ye. Ji kilamê tê famkirin ku aliyekî şer ji eşîra Mamedîyan in ku Bavê Esho, Bavê Filît, Senar Bavê Cengîz sê mêrxasên ji vê eşîrê ne û li hemberî wan jî li gorî kilamê kesekî bi navê Cewed heyê ku van mêrxasan bi artêş û cendirmeyên Îranê tehdîd dike. Li gorî kilamê dîyar e ku Cewed karkaterekî xayîn e û li dijî van mêrxasên Mamedîyan şîrîk û hevkarê artêşa Îranê ye. Kilam balê dikêşe ser cengawerî û şerê mêrxasên eşîra Mamedîyan û xisûsen li ser Senar Mamedî anku Senar Bavê Çengîz. Em dizanin ku Senar Mamedî 1924an de li Selmasê hatiye dinê û ji eşîra Mamedîyan e. Senar di 17 saliya xwe da dikeve nav refên Hizbî Demokratî Kurdistanî Îran û dibe berpîrsê liqê rojhelat û gelek xizmetan dike. Senar piştî salên 1960î li dijî rejîma Şah şerê çekdarî dike. Di sala 1965an de diçe tevî şoreşa başûrê Kurdistanê dibe û di şer de birîndar dikeve û teslîmê Îranê dikin û bi salan di zindanan Îranê de dimîne. Şer li minîtiqeya

Selmasê û li gorî kilamê li hêla Çemê Serhenanê (ev nav baş nehatiye tesbîtkirin) pêk hatiye.

Me hêj tesbît nekiriye gelo cara ewil vê kilamê Îran Xanimê li ser straye yan ji dengbêjekî din girtiye. Lê eşkere ye ku vê kilamê li ser şerê Senar Mamedî ye li dijî Îranê gotiye.



ENCAM

Îran Xanima Mucerrred (1951-2001) jî yek ji van hunermendan e ku yekem car bi awayekî fermî li rojhilatê Kurdistanê, di radyoya Ûrmiyê de kilam strane. Radyoya Ûrmiyê di sala 1969an de dest bi weşana Kurdî kiriye. Ji bilî Îran Xanimê dengbêjên weku Xalê Birê (Îbrahîm Newrozî 1928-2000), Hemîd Yûsifî (1926-1979), Mistefa Elîzade û Ehmed Ehmedî jî di Radyoya Ûrmiyê de bi salan kilam strane. Girîngiya Îran Xanimê di nav nerîta dengbêjiyê de bêyî Radyoya Ûrmiyê nabe ku bê ravekirin. Loma di vê xebatê de qala Radyoya Ûrmiyê û weku temsîlkara dengbêjên jin qala jîyan, kilam û şewaza Îran Xanimê hatiye kirin. Tê zanîn ku Îran Xanimê gelek kilam strane.

Em di vê xebatê de weku encam ghiştin çend xalên girîng. Ya yekem şewaza dengbêjiya Îran Xanimê û tesîrwerigirtina wê ya ji Dengbêj Xalê Birê ye. Herwiha Îran Xanim nêzî şewaza dengbêjên Serhedê bi devoka Behdînî kilam strane. Ya duyem mîna gelek dengbêjên jin serborî û sernivîştî wê ya xemnak e ku ev dîyar bû ku bi nasnameya wê ya jintiyê re gelek peywendîdar e. Herwiha vê nasnameya wê tesîrê li şewaza kilambêjiya wê kiriye. Xisûsen di kilamên evîna trajîk da em bi deng û hîsiyata wê dihesin. Ya sêyem jî rola Radyoya Ûrmiyê û tesîra wê ya li civak û dengbêjan û xuyabûna dengbêjên rojhilatê Kurdistanê bi awayekî neteweyî ye. Ji bo vê jî kilam Lo Axao ye ku li ser qeheremanekî neteweyî Senar Mamedî gotiye.

BENGÎTIYA MEDYAYA CIVAKÎ

SIYABEND ASLAN

Derûnnas, Mêrdîn, drn_s.aslan@hotmail.com

*“Bengîti ew tişt e ku jiyane bi mirov xweştir
dide xuyakirin lê di eslê xwe de pûç dike.”*

P. Estes





Îroroj bi milyonan însan bi rêya medyayê di nav têkiliyekê de ne. Her ku diçe bikaranîna medyaya civakî zêdetir dibe û ev jî bi xwe re bengitiyekê derdixîne holê. Bi vê bengitiyê mirov dikeve rewşeke wisa ku êdf karê xwe, malbata xwe, xwarin/vexwarin û razana xwe jî îhmal dike.

Gelo mirov dê çawa ferq bike ku ketiye bin bandora medyaya civakî û bûye yek ji wan bengiyan. Bo tespîtkirina vê yekê mirov bixwe jî dikare bersiva van pirsan bide û vê rewşê ferq bike: Gelo hûn di medyaya civakî de (facebook, instagram, twitter, blog û hwd) wextê xwe gelekî zêde xerc dikin? Wexta ku hûn bi kar neyînin jî hûn derbarê hesabên xwe yê medyaya civakî gelekî difikirin? Bi awayekî nihîçkî û bêhemdf xwe hûn di medyaya civakî de gelekî wext derbas dikin? Wexta ku hûn bi kar tînin hûn bi jiyana xwe ya rojane û bi pirsgirêkên xwe re mijûl nabin? Wexta ku hûn bi kar neyînin hûn gelekî bêhizûr dibin û dikevin rewşeke diltengiyê? Ev rewş bo karûbarê we, dibistan an jî jiyana we ya civakî dibe astengiyek?

Bengîtiya medyaya civakî di DSM-Vê de (Destpirtûka Teşxîs û Statîstîkên Nexweşiyên Zihnî - The Diagnostic and Statistical Manual of Mental Disorders) wekî nexweşiyekê nehatiye destnîşankirin. Lê di lîteraturê de wekî bengitiyê reftaran tê qebûlkirin. Takekesên bengiyên medyaya civakî wekî takekesên bengiyên dîtir yê reftarî û bengîtiya madeyan heman sîptomên nîşan didin. Tolerans û nîşêtên bêpariyê di bengîtiya medyaya civakî de jî hene. Kesê bengiyê înternet û medyaya civakî her diçe bêhtir dibe


hewcedarê wê û di înternetê de ji berê bêhtir wext derbas dike. Wexta ku bi kar neyîne jî nika-re bi xwe, gelekî dilteng dibe û aloziyan dijî.

Mirov ji bo çi medyaya civakî bi kar tîne?

Gelek kes bo ku wextên xwe yê vala derbas bikin, xwe tenê hîs nekin û kêfê bistînin, fêrî tiştên nû bibin û nûçeyan bişopînin, nas û dostên xwe û kesên navdar bişopînin, fikrên xwe û jiyana xwe ya rojane parve bikin, ji xwe re hevalên nû bibînin medyaya civakî bi kar tînin. Helbet ev tiştê normal e û heya radeyekê hewcedariyek e. Lê wexta ku mirov van tiştan bêyî qontrolkirinekê bike û jiyana xwe ya rojane paşguh bike ev dibe pirsgirêkek û bo wan mirovan hin alozî derdikevin holê. Bi taybetî jî gelek ciwan ji ber taybetmendiyên xwe yê qonaxa kamilbûnê jî bo ku xwe gelekî tenê hîs dikin, zû xemgîn û hêrs û aciz dibin, pirsgirêkên nav malbatê dijîn û dikevin nav lêgerînekê wextên xwe bêhtir di medyaya civakî de derbas dikin û ji ber ku di qonaxê hesas de ne dibe ku bi hesanî bikevin nav xeletiyên jî; rol-modelên nebaş bipejirînin û hevaltiyên nebaş bikin.

Bandorên neyîni

Takekes bo danûstandin û parvekirinên xwe medyaya civakî gelekî bi kar tîne û dikeve bin bandora wê. Wekî ku min li jor jî behs kir ev bikaranîna zêde bi xwe re hesta bêngitiyê derdixîne pêş. Û ev bengîtiya jiyana mirovan



bi awayekî neyînî dixê bin bandora xwe û dike ku mirov jiyana xwe hemûyî bi medyaya civakî ve girêbide. Bi şewazeke din em dikarin bibêjin ku bikaranîna zêde ya derveyî armançê dibe sedema bengîtiyê.

Bengîtiya medyaya civakî bi xwe re gelek pirsgirêkan derdixîne holê. Em dikarin hin ji van rewşên neyînî wisa rêz bikin: Tevgerên agresîf, hêrsbûn, bêpergalîyên kesayetiyê, zehmetkêşiyên fêrbûnê, pirsgirêkên danûstandin, malbat û dibistanê, obezîte, di xwarin û vexwarinê de pirsgirêkên dîtir, dûrketina ji civatê, xwetenêhiştin, depresyon, anksiyete, pirsgirêkên xewê û hwd.

Tedawî

Ji ber ku bengîtiya medyaya civakî bi xwe re gelek pirsgirêkên derûnî û fizîkî tîne pêwîste tedawiya wê bê kirin. Bo rewşa tedawiyê jî lêkolîner û terapîst teknîkên gelek cuda bi kar tînin. Bi saya van rê û



rêbazên curbicur bengîtiya takekes kêm dibe an jî tê wê radeyê ku takekes xwe bi temamî ji bengîtiyê rizgar dike. Em dikarin hin ji van teknîkên tedawiyê wisa rêz bikin: Li ser bikaranîna înternetê û wextê ku takekes di înternetê de xerc dike lêkolînek tê kirin û bo takekes plansaziyeke nû tê amadekirin; divê bo wextê ku di înternetê de tê xercîkirin mekanîzmeyeke qontrolê hebe û mirov serî li hişyarkeran bide; bo ku bikaranîna înternetê bê kêmkirin gelek çaran encamên bengîtiyê yên neyînî bîn bibîrxistin; bo ku takekes xwe ji bengîtiya înternetê û medyaya civakî xelas bike dikare tevî komên piştgiriyê bibe û bi wan kesên wekî xwe re têkeve danûstandinekê û ji vê rewşê moral û motîvasyonê bistîne; herwiha divê bo bikaranîna medyaya civakî plansaziya wextê bê kirin û takekes li gorî wê plansaziyeke tevbigere; piştgirî û alîkariya malbatê jî roleke sereke ye da ku takekes xwe baştir hîs bike û bo xelasîya ji bengîtiyê hewl bide.

Takekes bo ku xwe ji bengîtiya medyaya civakî rizgar bike divê jiyana xwe di ber çavan re derbas bike û hin aktîvîteyên dîtir pêk bîne. Çawa ku mirov bo kîloyên zêde bide dikeve perhîzê û xwarina xwe kêm dike heman tişt bo vê rewşê jî derbasdar e. Mirov dikare perhîza înternetê û ya medyaya civakî jî bike, di nava rojê de xwe ji amûrên înternetê dûr bixe û têkeve perhîza wê. Takekes dikare di rewşeke wisa de sporê bike, ji xwe re wext veqetîne û pirtûkan bixwîne, li fîlman temaşe bike, têkeve nav civatê û bi nas û dost û hevalan re têkiliyên rûbirû deyne û hwd.

Wekî din bi rastî jî berî ku zarok û ciwan bibin bengiyekî medyaya civakî û pêşî li vê rewşa bengîtiyê bê girtin hayjêbûna dêûbavan ya bo zarokên xwe, çavderîkirin, eleqê, dilsozî, hezkirin û dilgermiya wan gelekî girîng e. Divê em hay ji vê rewşê hebin da ku em li gorî wê tevbigerin û bi vê pirsgirêkê re serî derbikevin.

JIM JARMUSCH: YEK JI NÛNERÊ HERÎ SERKEFTÎ YÊ SÎNEMAYA SERBIXWE

RÛMET MED

Nivîskar, Wan





Hunera sînemayê ji destpêka xwe û heta niha, dilop bi dilop wekî okyanûseke bêdawî mezin bûye û bi rengên nû û resen diherike. Di vê pevajoja herikîna hunera heftemîn de; gelek sînemagerên bêhempa, resen û serbixwe derketine ku bi filmên xwe bandorên mezin afirandine û mohra xwe li dîroka sînemayê xistine. Jim Jarmusch yek ji van derhênera ye.

Derhêner, senarîst, pevbestîner, çêker û lîstikvanê navdar ê hunera sînemayê Jim Jarmusch li seranserê cîhanê bi filmên xwe yên serbixwe û resen deng vedaye. Jarmusch, di koma muzîkê ya Del-Byzanteensê de jî weke klavyevan cih girtiye.


Jim Jarmusch li New Yorkê mezin bûye, di 22yê Rêbendana 1953yan de li bajarê Cuyahoga Fallsê yê girêdayî parêzgeha Ohioyê ya DYAyê hatiye dinê û di 1980î de yekem filmê wî yê bi navê "Permanent Vacation" ketiye vîzyonê.

Yek ji derhênerê herî serkeftî yê Sînemaya Serbixwe, derhêner Jarmusch piştî çar salan bi filmê xwe yê "Stranger Than Paradise" (1984) derket pêşberî temaşevanên sînemayê. Ev film him ji bo sînemaya serbixwe ya nûjen filmekî girîng e, him jî vî filmî gelek kevneşopiyên çêkirina filman ên sînemaya Hollywoodê dan guherîtin. Ev film, qala hêvîyên sê ciwanan dike û rêwîtiya wan a ji New Yorkê ber bi herêmên Cleveland û Floridayê nîşan dide. Di sala 1986an de filmên Jim Jarmuschî yên; "Coffee and Cigarettes" (6 deqîqe, kurterêzefilm) û "Down by Law" tên kişandin. Kurterêzefilmên "Coffee and Cigarettes"ê yek ji projeya herî girîng ya derhêner bû ku tê de Roberto Benigni û Steven Wright jî lîstin. Di nava kurterêzefilmên de "Coffee and Cigarettes: Memphis Version" (8 deqîqe, 1989), û "Coffee and Cigarettes: Somewhere in California" (12 deqîqe, 1993) jî cî digirin. Herwiha ev hemû kurtefilm di sala 2003an de bi navê "Coffee and Cigarettes" hatin nîşandan ku bi tevahî ji yanzdeh beşan pêk tînin û di navbera lîstikvanên filmê de; Jac û Meg (Endamên koma muzîkê ya "The White Stripes"ê), Cate Blanchett, RZA, GZA, Bill Murray, Steve Coogan û Alfred Molina jî hebûn.

Filmê "Down by Law", li ser çîroka du girtiyên girtîgeheke New Orleansê disekine û tê de lîstikvanên navdar ên Tom Waits, John Lurie û Roberto Benigni lîstine. Senaryoya film Jim Jarmusch bi xwe nivîsiye ku weke reş-spî hatiye kişandin. Derhênerê serkeftî, di filmê xwe yê bi navê "Mystery Train" (1989) de behsa çîrokên mirovên li heman hotêlê dimînin dike û ji sê beşan pêk tî.

Piştî du salan filmê Jim Jarmuschî yê nû "Night On Earth" dikeve vîzyonê. Film, di şevê de li pênc bajarên 4 dewletan diqewime û çîrokên pênc ajovanên teksîyan tîne ser perdeya spî. Night On Earth, yek ji mînakên baştirîn û herî resen ê sînemaya serbixwe yê DYAyê ye.

Filmê derhêner Jim Jarmuschî yê "Dead Man" (1995) qala rastîhevhatina "William Blake" û çermsokekî bi navê "Tu Kes"ê dike û mijara film di sedsala 19an de li Rojavayê Amerîkayê diqewime. "Dead Man" yek ji berhemên sereke yên Jarmuschî tê qebûl kirin û bi gotina wî filmekî "Psychedelic Western"ê (Acid Western) ye ku di nav xwe de hêmanên surrealîst û bêhempa yên cureya Westernê dihewîne û bi awayekî monokrom hatiye kişandin. Derhênerê dîmenê yê film Robby Muller e û muzîk jî Neil Young çêkirine ku "Dead Man" ji aliyê rexnegirên sînemayê ve weke "Anti-Western" û "Post-Western" hate binavkirin.



“Her şevê û her sibê,
 Diwelidîn hin kes, ji êşê re.
 Her sibê û her şevê,
 Diwelidîn hin kes, ji kêfa şîrîn re,
 Her şevê û her sibê,
 Diwelidîn hin kes, ji şeva bêdawî re...”

(Ji filmê “Dead Man”,
 Helbest: William Blake)

Piştî belgefilma wî ya “Year of the Horse(1997)” û filmê “Ghost Dog: The Way of the Samurai(1999)” tên. “Ghost Dog: The Way of the Samurai”, çîroka çermreşekî tîne ser perdeya sînemayê ku dixwaze wekî Samurayekî bijî û li gorî rêbaz û ramanên Rojhilatê tevdigere. Di sedsala nû de jî digel gelek derhênerên sînemayê yê wêkî Víctor Erice, Aki Kaurismäki, Werner Herzog, Çen Kaige, Wim Wenders, Spike Lee ve, filmê bi navê “Ten Minutes Older: The Trumpet” (Beşa “Int. Trailer Night”, Kurtefilm, 2002) dikişîne.

Piştî filmê “Broken Flowers(2005)” ku tê de lîstikvanên wekî; Bill Murray, Jeffrey Wright, Sharon Stone, Tilda Swinton, Frances Conroy û Julie Delpy lîstibûn dikişîne û bi filmê “The Limits of Control(2009)” serkeftina xwe didomîne.

Derhêner Jim Jarmusch piştî 4 salan bi filmê xwe yê bi navê “Only Lovers Left Alive” re ji nû ve derdikeve pêşberî temaşevanên xwe. Film, bi cureya bohemê hatiye kişandin û qala çîroka du xwîn-mijan (vampir) dike ku evîndarê hev in. “Only Lovers Left Alive”, li Festîvalên Fîlman ên Navneteweyî yê Cannes, Sundance, Torontoyê û li Xelatên Ruhê Serbixweyê hatibû nîşandan û ji Cannesê Xelata Muzîka Baştirîn girtiye.

Dûvre filmê Jarmuschî yê “Paterson(2016)” dikeve vîzyonê ku li ser çîroka Paterson û Laurayê disekine. Paterson (Adam Driver) ajovanekî otobûsê ye û helbestan dinivîse, hevsera wî Laura (Golshifteh Farahani) gelek ji helbestên wî hez dike û dixwaze helbestên Patersonî bêne çapkirin. Film, promiyera xwe ya cihanê li Festîvala Fîlman a Cannesê kiribû û ji bo Xelata Palmîyeya Zêrîn ketibû pêşbaziyê, ji bernamaya festîvalê Xelata Palm Dogê girtibû.

Jarmusch di heman salê de belgefilma xwe ya bi navê “Gimme Danger(2016)” weşand û herî dawî jî bi filmê xwe yê bi navê “The Dead Don’t Die (Cure: Tirs-Komedî, 2019)” derket pêşberî sînemahezan. Derhênerê hoste Jarmusch, di filmên xwe de bal kişand ser mijarên takekesî û civakî ku bi zimanekî resen û serbixwe, çîrokên xwezaya jiyane tîne ser perdeya hunera sînemayê.

Xelatên din ên Jim Jarmuschî:

- Xelata Rêzê ya Filmê Serbixwe yê Gothamê,
- Xelata Bodilê ya Filmê Amerikan ê Herî Serketî,
- Di beşa Kurtefilman de Xelata Cannesê,
- Xelata Filmê Herî Serketî yê Li Derveyî Ewropayê.



Fîlmên ku di jenerîkên wan de navê Jim Jarmuschî hene:

- Lightning Over Water (1980) Observer.
- You Are Not I (1981) - Çêker, sînematoğrafî.
- Der Stand Der Dinge (The State of Things) (1982) - Bestevan.
- Burroughs (1984) - Qeyda Dengê.
- Sleepwalk (1986) - Operatorê kamerayê, derhênerê dîmenê.
- When Pigs Fly (1993) - Çêker.
- Clerks (1994), spasîya taybet.
- Enron: The Smartest Guys in the Room (2005), spasîya taybet.

Fîlmên ku Jim Jarmusch tê de weke listikvan cih girtine:

- Underground U.S.A. (1980) - Tomarvanê dengê.
- American Autobahn (1984) - Çêkerê Fîlman.
- Straight to Hell (1987) - Amos Dade.
- Helsinki Napoli All Night Long (1987) - Parêzkarê barê.
- Candy Mountain (1988).
- Leningrad Cowboys Go America (1989) - Firoşkarê otomobîlan.
- The Golden Boat (1990) - Biyanî.
- In the Soup (1992) - Monty.
- Iron Horseman (1995) - Silver Rider.
- Blue in the Face (1995) - Bob.
- Cannes Man (1996) - Cameo.
- Sling Blade (1996) - Frostee Cream guy.
- Fear and Loathing in Las Vegas (Book on Tape) (1996) - Raoul Duke (deng).

Çavkanî:


“Jim Jarmusch”, Berhevkar: Ludvig Hertzberg, Wergerê ji bo Tirkî: Selîm Ozgul. Weşanên Agorayê (2011)
https://en.wikipedia.org/wiki/Jim_Jarmusch
<https://www.imdb.com/name/nm0000464/>
https://tr.wikipedia.org/wiki/Jim_Jarmusch




TELESKOPA FEZAYÊ JAMES WEBB

DIGIKURD

Lêkolîner, Washington DC





James Webb teleskopa herî mezin û pêşketî ya cîhanê ye. Di 25ê Berfenbara 2021î de ji bo asîmanên kûr û tarî hat firandin. James Webb ji Hubblê 100 caran çêtir û pêşketîtir e. Ev teleskop wê bibe çavên me yên nû yên li fezayê. Dibe ku bi milyaran stêrk bi saya wê bîn kifşkirin. Dibe ku temenê 15 milyar salî yê gerdûnê bi saya James Webbê çêtir were zanîn.

Mirovahî ji destpêka medeniyetê heta niha her tim li pey hebûna xwe bû. Meraq kir û ev meraqa xwe pêş ve bir. Bi sedan teleskop hatin çêkirin da ku feza baştir bê dîtin û zanîn. Ev teleskop her ku çû mezin bûn. Piştî ev teleskop hatin şandin fezayê. Niha bi dehan teleskop bûne çavên dinyayê û li kûrahiya gerdûnê digerin. Hubble ji bo gerdûnê bi serê xwe şoreşeke mezin bû. Lê James Webb jê jî pêşdetir e.

“Teleskopa herî pêşketî ya heta niha ye”

Navê teleskopê ji navê dîrektorê berê yê NASAyê James Edwin Webb tê. 15 dewlet piştgiriya didin James Webb. Di çêkirina teleskopê de Jûra Feza û Asîmangeriya Neteweyî (NASA), Ajansa Fezayê ya Kanadayê (CSA) û Ajansa Fezayê ya Ewropayê (ESA) rola herî mezin lîstin.

James Webb zêdetir wê li ser avabûna gerdûnê bixebite û hûrgiliyan bişîne dinyayê. Çêbûna gerstêrkan, çêbûna stêrkan û gelek tiştên din ên di gerdûnê de hêj jî bala mirovahiyê dikişîne. Ev meraq, her ku teknolojiya bi pêş ve diçe zêdetir dibe.

Ji bo ku em bizanin ev teleskop çiqas giring e divê em pêşiyê li zanebûna xwe ya heyî binêrin. Di salên 90î de mirovahî ji bo ku fezayê çêtir bizanibe, teleskopa Hubble şand fezayê. Ev yek,

ji bo mirovahiyê gaveke şoreşî bû. Heta niha piraniya dîmenên fezayê, bi çavên Hubbleyê hatine ber me. Teleskopa Hubble li gorî teknolojiya berê çiqas pêşketî be jî îro têra zanebûn û lêkolînên mezin nake. Bi saya Hubbleyê mirovahî hîn bû ku mezinbûna gerdûnê ji texmînan wêdetir e.

Lê îro ev texmîn wê bi dellîlên heyî piştrast bibe. Teleskopa James Webb êdî li gerdûnê çavê nû yê mirovahiyê ye. Ji bo ku em çêtir fam bikin em dikarin wisa muqayese bikin. *Heke Hubble merceka be James Webb mikroskop e.*

James Webb wê çi bike?

James Webb bi spektrûma înfared (tirêjên jêrsor) wê karibe dîmenên 3 alî yên gerdûnê çêbike. Ev dîmen wê bihêle em gerdûnê çêtir şirove bikin. Bi çavên xwe yên tûj James Webb dikare tirêjên bi milyar salên berê jî bigire. Îro bi milyaran stêrk hene ku temirî ne lê hêj ronîya wan heye.



Ji bo ku em vê teleskopê baştir nas bikin divê em li wêneyên ku wê şandine binêrin.

Li vê derê yekem wêneyê teleskopa Webbê heye.

NASAYê ev wêne li ser malpera xwe weşand û got *“yekem wêneyê bi tirêjên jêrsor ên kûr û tûj.”*

Di berdewamiya nivîsê de wiha hat gotin;

“Ev wêneyê balkêş û xweşik serkeftina teknîkî ya bêhempa temsîl dike. Lê ew di heman demê de serkeftina ecêb a mirovahiyê jî temsîl dike. Teknolojiya ku bi dehan salan destê zanyar û endezyaran lê ket îro bi wêneyekî kûr tê temsîlkirin.”

Teknolojiya pêşketî ya li ser teleskopê wê tevî tirêjên jêrsor, temen û giraniya gerstêrkan jî bizanibe. Eynika li ser teleskopê bi zêr û berilyûmê hatiye biriqandin û dikare atmosfera gerstêrkên din jî tespît bike. Bi saya cîhazên hesas li gorî rewşa hewayê yan jî talûkeyên li fezayê teleskop her tim di hevsengiyê de dimîne.

Ev wêne ji bo ku em James Webb baş fam bikin mînakeke gelek serkeftî ye. Lewra di vî wêneyê de tirêjên ku xuya dikin ne stêrk an jî gerstêrk in ew bi temamî galaksî ne. Di her misqaleke van tirêjan de bi milyaran stêrk hene. Her yek ji wan bi qasî kadizê yan jî galaksiyên jê mezintir in. Ev bi tena serê xwe nîşan dide ku teleskopa James Webb dikare gerdûnê çiqas nêz bike.




Teleskopa James Webb çawa hat şandin?

Webb di nav roketekê de hat bicihkirin. Eynik û milên teleskopê piştî kontrolên bi salan wek otomatîk li fezayê vebûn. Eynik pêşî bû çar qatên li ser hev û paşê li fezayê ev perçe dîsa gihiştin hevdu.

Ji bo ku di rêwîtiya wê ya nepen de pirsgirêk dernekeve gelek ceribandî hatin kirin. Endezyaran bi salan lêkolîn kir û testên cîhazan kirin. Ji ber ku pirsgirêkek biçûk jî dikare hemû keda projeyê betal bike.

James Webb wê di rêgeha stêrkê de bizivire û em ê bi vê yekê re karibin dîmenên dûrtir ên gerdûnê bibînin. James Webb wê karibe 300 milyon saletirêjen berê bibîne. Herwiha wê ji 10 salan zêdetir li ser wezîfeya xwe be. Di van 10 salan de mirovahî dibe ku karibe çîroka 14 milyar salî ya gerdûnê hîn bibe.








Koma Kovargerên Kurd

Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bîne ba hev, bingehêka sazgehîyê bide kovargerîya kurdî, kovargerîya kurdî hem bi sêwirandinê hem bi naverokê bi pêş da bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev ra çareser bike hatîye damezirandin.

Kovarên Endam







 /KovargerênKurd
 KovargerênKurd@gmail.com

The **Hall** Kurdî
Endama Koma Kovargerên Kurd e